Di tenêyatiyê de

Nameyên te
di yasayên min yên xweristî de
sirûdan peyrew dike.
Li gel pirsa aşiqên serdemî
di nav vejeniya rêpîvana cadeya min
sema erşê te di selîqeyên pêxwas de,
dibine pêleka bayî
û di davên tevinpîrkan de
hestên sar jê diçin.
Kî weku min
hişyarî memleketa mijûlankên te yên xapînok e?
Ez û tîrojkên wê di şevên baranê de,
senfoniya xatirxweztinê
di rêbaza hilawistî de lê didin.
Tu serkêşê nexşeyî
yariya maçan di rûyên mangirtî dikî?
Ez û ezmûn
tu û diyalog
di warên tenêyatiyê de
dibine panoramayeka bêdeng.
Li ser mêza danûstandinan
kûratiya rengên te
li gel hedara qelemê min
di varîbûna çavên sil de
tirajediya lêkvebûnê
di yada berberên qurmiçî de dinixêvin
û li pirsgeha kulavên serdemî de
silavan li ezmûnên man û nemanê
dibarînin.